Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1312 | 1-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Qada medya dijîtal, bandor û çareserkirina pirsgirêkên wê

Navenda Nûçeyan

**Bikaranîna medyaya dijîtal mijareke ku temenê wê ne gelekî dirêj e, lê arîşeya herî bibandor e di dîroka mirovahiyê de. Bi rêya qada medyaya dijîtal bi rengekî şaş dagirkirina mejî hêsan dibe û mirov ji çareserkirina pirsgirêkên wê direve.**

### Derketina qadên medyaya dijîtal

Amûrên medyaya dijîtal di roja îro de bûne beşeke mezin ji piraniya dema mirovan. Ev yek ji bo danûstandina bi malbat, heval û derdorê re, heyanî meşandina xebata siyasî, pîşeyî û hwd… vê yekê jî hişt ku her mirovek bi hêsanî têkiliyê bi mirovekî din re bike eger nêz be an ji welatekî dûr be. Li alyekî din mirov dikarîbû deng, reng, bûyer û hemû agahiyên sererd û binerdê cîhanê, herwiha stêrknasiyê bizanibe û bibîne. Bikaranîna cîhana teknolojî di destpêkê de bi riya televizyonan pêk hat bi taybet di sala 1927’an de yekem televizyon li ser destê Philo Taylor Farnsworth yê Amerîkî hat çêkirin. Paşê asta teknolojiyayê li pêş ket û di sala 1945’an de yekem computer ku sîstema wê tê sazkirin li Zanîngeha Pinsilfanya ya Amerîkî hat çêkirin. Herwiha di sala 1981’ê de computera destan ango laptop li ser destê Adam Osborne hat afrandin. Di sala 1983’yan de mobayla elektronîk hat çêkirin, paşê televizyon, laptop, computer, mobayl û hemû amûrên mediyaya dijîtal li pêş ketin û bernameyên curbecur ên girêdayî wê, weke fecbook, whats app, instigram, tiwtter, you tube, malper û hwd derketin. Êdî dengê civakê derket, têkiliya di navbera mirovan de xurtir û nêztir bû, hemû qadên danûnstandinê yên elektronîk ên mediyaya dijîtal bi erênî û neyînî ji hêla mirovan, dezgeh, partî, desthilat û hikumetan ve hatin bikaranîn.

### Erênî û neyîniyên bikaranîna medyaya dijîtal

Bikaranîna qadên mediyaya dijîtal ji hêla mirovan, civak û dezgehan ve rewşeke dualî derxist hole, aliyek jê erênî tê nirxandin û aliyek jî neyînî ye. Aliyê erênî ew bû ku her kes bi riya mediyaya dijîtal, bi name, wêne, dîmenan dikarin li her derê têkiliyên danûstandinê ava bikin. Herwiha bi rengekî bi leztir agahiyên pêwîst li ser malperan bi dest bixin û nûçeyan bizanibin. Li aliyê perwerdeyê jî mirov bi rengekî komî û hevbeş sûdê ji mediyaya dijîtal werdigire. Li aliyekî din xebata firotina kelûpelan û bazirganiyê ya li ser onlayînê bi erênî û neyînî li pêş ket. Di heman demê de naskirina çand, ziman û kultûra netewên cîhanê û hevgirtina civakî ji serdemên berê baştir bû. Lê bi qasî deh caran jî neyîniyên bikaranîna mediyaya dijîtal hene. Di serî de Mirov dibin esîrên cîhaneke derveyî jîwariya cîhana xwe, asta danûstandina civakî kêm dibe. Komkirina agahiyên mirovan û xwarina gefan li ser eşkerekirina gelek tiştên taybet. Hem jî gelek kes xwe bi navê kesên din xebateke xerab dijî nirxên mirovahiyê dikin. Sîpe û zarok herî zêde dikevin bin bandora mediyaya dijîtal de û carcaran agahiyan belav dikin an jî mediyaya dijîtal bi rengekî şaş bi kar tînin. Bikaranîna zêde ji bernameyên mediyaya dijîtal dihêle têkiliyên mirov bi malbat, civakê re ji holê rabin. Bikaranîna şaş ya bi seetên dirêj li ser mobaylan asta pêşketina mejiyê mirovan kêm bibe û nexweşiyên derûnî çêbibin, hem jî xemsarî û dûrketin ji raketinê pêk were. Herwiha digihêje ku mirov xwe ji ber bernameyên lîîstikan, pêşbirêkên civakî û hwd… xwe bikuje.

### Asta bikaranîna mediyaya dijîtal

Wekî tê dîtin bi awayekî rojane bernameyên bi dirav û bêdirav derdikevin ev yek jî bi pêşketina serdema tecnolojî ya ku dihêle hişê mirov jê matmayî bimîne, tê kirin. Ev hemû pêşketin bi destê dewletên desthilatdar ên ku bi riya teknîkê dixwazin jiyana zêdeyî 5 milyar mirov bixin bin destê xwe, bername, amûrên teknîkê, mobayl û laptobên pêşketî bifroşin civakê û qapîtalîm bi vê yekê xurtir bibe. Lê ya balkêş ew e ku bernameya hişê çêkirî di van salên dawî de hatiyek çêkirin bi du rengan, yek jê bi dirav e û yê din bê dirav e.



Chat GPT bernameyeke ku mirov ji bo bidestxistina agahiyan, bi kar tînin. Lê gelek rewş di nav civakê de derdikevin ku mirov piraniya dema xwe bi axftina bi Chat GPT re derbas dikin, hişê çêker dibe hevalê wan mirovan ê nêzîk, di encamê de jî takekes ji civaka xwe dûr dikeve. Di heman demê de dûrî zanist, lêkolîna durist, ruhê civakê, wêjeyê û jiyana pak dikev.

### Çareserî

Weke tê zanîn êdî mirov, qada mediyaya dijîtal û mobayl ji xwe re kirine heval, her kesayetek dûrî cewherê xwe û cewherê civaka xwe ketiye, bûye mulkê mediyaya dijîtal. Di heman demê de mirov û civak ji hêla aliyên veşartî û destên tarî ve, rastî şerê taybet tên. Da ku mirov nekeve bin bandora şerê taybet û bikaranîna mediyaya dijîtal a şaş divê hin gav bên avêtin. Di serî de pêwîst e dema rahiştina mobaylan kêm bibe û dem ji bo danûstandina bi malbatê re, were veqetandin ev dem jî pêwîst e bê internet û mobayl derbas bibe. Di heman demê de divê hişmendiya naskirina nûçeyên rast bi riya semînerên li dijî şerê taybet. Herwiha dûrketina ji bernameyên ku dema mirov winda dike weke tiktok û hwd… Li aliyekî din pêwîst e mirov mediyaya dijîtal ji bo xizmeta aliyê baş bi kar bîne bêyî ku li ser riya neyînî bimeşe û bikeve bin bandora şerê taybet ên ku sîstemên kapîtalîzm dimeşîne. Hem jî pêdivî heye ku mirov rêbazên herî guncav ji bo bikaranîna mediyaya dijîtal hilbijêre. Ev yek jî bi xwendin, dûrketina ji mobaylan û civakbûyînê pêk tê.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Daweta mitirban û mitirb lê bixin:**
- Ku wisa be jixwe wê xweş be; ku wisa be jixwe wê pir baş be.

**Dendik jê berdan:**
- Pir baş çêkir; pir xweş kir; ji heq derket; xemiland.

**Dendik jê derxistin:**
- Bi heman wateyê.

**Gotinên ti kesî nayne ser xwe:**
- Ti kes wî rexne nake; nahêle ti kes rexne bike; karê xwe baş dike.

**Gulîvandik jê berdan:**
-Pir baş çêkir; pir xweş kir; ji heq derket; xemiland.
)Dema yek di karekî de serketfî be, ji kar baş fêm kiribe jê re tê gotin(

**Hê dengê dîkan nebihîstiye:**
- Hê nû ye; hê teze ye; hê kevin nebûye; pir xweş çêbûye.
)Bi taybetî ji bo çayê tê gotin)

**Nediçû dawetê, dema diçû digot lot ha lot:**
- Ji wî karî hes nedikir, lê dema dikir jî ji her kesî baştir dikir.

**Sîsik jê firandin:**
- Karê xwe pir baş kir.

**Toz jê bir/toz jê rakir:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BIRÇÎBÛNÊ**

**Cewrikên zikê wî direyîn:**
- Pir birçî bûye.

**Çavên wî zer bûne:**
- Pir birçî bûye; ji nêza perîşan bûye; hindik maye ku ji nêza bimire.

**Emê lingan li devê seyan bidin:**
- Emê ji nêza bimirin; emê perîşan bibin.

**Ji nêza kevçika dilê min diêşe:**
- Ez pir birçî bûme.

**Kevçika dilê min diêşe:**
- Ez pir birçî bûme.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## Armanca Meclisa Jinên Sûriya parastina mafê jinê ye



Bi armanca parastina mafê jinê û avakirina civakeke exlaqî û demokratîk di sala 2017’an de Meclisa Jinên Sûriya hate avakirin. Herwiha Rêveberiya Meclisa Jinên Sûriya ya Ofîsa Helebê Leyla Xalid diyar kir ku ew hewil didin navend û ofîsên xwe li ser asta Sûriyê ava bikin. **R-2**

## ‘Hikumeta veguhêz parçekirina Sûriyê qebûl kiriye’



Ji Navenda Kurdî ya Lêkolînan Dr. Tariq Hemo destnîşan kir ku zihniyeta Colanî olîgraş û cîhadîst e ku temenê wê ne dirêj e û got, “Hikumeta veguhêz rewşa parçekirina Sûriyê qebûl kiriye û dixwaze bi destê Tirkiyê Rêveberiya Xweser têk bibe”. **R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1312 | 1-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ‘ISRARA NAVENDÎBÛNÊ WÊ SÛRIYÊ PARÇE BIKE’

Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd diyar kir ku pêwstiya gelên Sûriyê bi pergaleke nenavendî heye ku taybetmendiyê her herêmekê û mafê tevahî pêkhateyan biparêze. Bedran Çiya Kurd da xuyakirin ku israrkirina di pergala navendî de, tê wateya israrkirina di parçebûn û belavkirina Sûriyê de ye. **R-3**




## ‘Pêwîst e ciwan tev ramanê Rêber Apo bixwînin û xwe bi rêxistin bikin’




Ciwanên bajarê Qamişlo diyar kirin ku derketina derveyî welat ne çareserî ye, berovajî wê ciwan dikevin bin xizmeta hêzên desthilat de û wiha gotin: “Pêwîst e her ciwanek fikir û felsefeya Rêber Apo bixwîne û li hemberî polîtîkayên ku li ser civakê tênê meşandin, têkoşînê bimeşînin û xwe bi rêxistin bikin” **R-5**

## Peymangeha Orkêstra ruhê muzîkjeniyê di dilê zarokan de diçîne



Zarokên ku di Peymangeha Orkêstra de xwe fêr dikin dest nîşan kirin ku mamosteyên muzîkê wan bi rêbazekî hêsan fêrî amûrên muzîkê dikin, hem jî piştgiriya wan dikin, da ku hîn bêtir xwe di warê muzîkê de li pêş bixin. **R-7**

## ‘Dagirkeriya Tirk dixwaze bi talankirina şûnwaran dîroka Efrînê winda bike’



Endamê Meclisa Bilind a Şûnwarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selah Sîno destnîşan kir ku bi talankirina şûnwarên Efrînê dewleta Tirk zagonên navneteweyî bin pê dike û wiha got: “Dagirkeriya Tirk dixwaze bi talankirina şûnwaran dîroka Efrînê winda bike.” **R-6**

Çareserî ji saziya malbatê rizgarkirin e — Nehîr pale — R-2


HTŞ’ê bi van siyasetan ben li stûyê xwe badide — Dilyar Cizîrî — R-4


3 Fotograf û şerm — Farûk Sakik — R-5

Sûriyê çawa tê rêvebirin? — Zekî Bedran — R-5


Avakirin û Parastina Civakê — Rohat Bulut — R-6

# Armanca Meclisa Jinên Sûriya parastina mafê jinê ye

Bi armanca parastina mafê jinê û avakirina civakeke exlaqî û demokratîk di sala 2017'an de Meclisa Jinên Sûriya hate avakirin. Herwiha Rêveberiya Meclisa Jinên Sûriya ya Ofîsa Helebê Leyla Xalid diyar kir ku ew hewil didin navend û ofîsên xwe li ser asta Sûriyê ava bikin.

**Dîlan Mulhim/Heleb**

Meclisa Jinên Sûriya di 8'ê Îlona 2017'an de bi armanca parastina mafê jinê û avakirina civakek exlaqî û demokratîk hate avakirin. Lê ji ber desthildariya rêjîma Baas a berê nikarîbû navend û ofîsên xwe li tevahiya Sûriyê ava bike, herwiha niha jî ji ber hişmendiya hikumeta veguhêz nikarin navend û ofîsên xwe li ser asta Sûriyê ava bikin. Navend û ofîsên wan li bajarê Şam, Heleb, Laziqîyê, Efrîn, Reqa, Tebqa, Dêre Zor, Hesekê û Qamişlo ne. Di heman demê de, Mecilsa Jinên Sûriyê hewldanên xwe dikin ku navend û ofîsên xwe li asta Sûriyê ava bikin.
Di derbarê kar û xebatên Meclisa Jinên Sûriyê de, Rêvebera Meclîsa jinên Sûriyê ya Ofîsa Helebê Leyla Xalid ji Rojnameya me re axivî.



### Armanca Meclisa Jinên Sûriya avakirina civakek exlaqî û demokratîk e

Leyla Xalid diyarkir ku Armanca Meclîsa Jinên Sûriyê avakirina civakek exlaqî, demokratîk e û jin beşdarî guherîna makazagona nû ya welat bibin ku mafê wan tê de misoger be, herwiha ji bo jin hişyar bibin û xwedî biryarbin ku hemû mafên xwe nasbikin hewil dide zemînek çandî ava bike. Û wiha anî ziman ku "desthildariya Rêjîma Baas heta ku li ser desthilatdariyê bû rê nedida ku navend û ofîsên xwe li tevahiya Sûriyê vekin Da ku jin karibe di her beşên jiyanê yê heyî de cihê xwe bigire, çi aliyê aborî, ragihandin, zanistî, civakî û siyasî be jî, herwiha da ku di destûra Sûriyê de mafê jinan bê parastin û jin were naskirin, meclisa jinên Sûriyê hat avakirin. Ji tevahiya erdîngariya Sûriyê me jin anîn gel hev û sîwanek ji wan re avakir. Me ji jinên êlan(Eşîr) dest pê kir. Ji ber ku di nava êl û eşîran de hişmendiya zilam tê meşandin"

### Kar û xebatên Mecilsa jinên Sûriya

Leyla axaftina xwe wiha berdewam kir: "Em hewldidin ku navend û Ofîsên xwe li ser asta Sûriyê avabikin. Herwiha em kar û xebateke pîroz didin meşandin, kar û xebatên me di çarçoveya komxebat, semîner, panêl, civîn tên kirin. Gelek danûstaninên me bi rêxistinên jinan yên navdewletî re hene, herwiha gelek têkilyên me yên dîplomasî bi hêzên cîhanî re hene. Di heman demê de, em her dem li ser zagon û pîvanên navneteweyî yên mafê jinan semîneran didin, zagonên jin yên ku di desteya jin de li darxistine. Em dixwazin bi rengekî fikrî û siyasî Mecilsa jinên Sûriyê di nava Sûriyê de pêş bixin."

### Xebatên jin neketin berjewendî û sîstemên desthildariya dewletan

Leyla Xalid da zanîn ku xebatên jin neketin berjewendî û sîstemên desthildariya dewletan û wiha pê de çû: "Hişmendiya ku niha li Sûriyê ji aliyê hikumeta veguhêz a Sûriyê ve tê meşandin, Hişmendiyeke yek alî û yek reng e. Di heman demê de hişmendiyeke radîkare û bi tu aweyî mafê jinan di Sûriya nû de napejrîn e. Her tim ev hikumet hewldanên xwe dike ku vê hişmendiya xwe ya tundirew li ser gelê Sûriyê û bi taybet li ser jinan ferz bike. Helbest ev yek dibe astengî li pêşiya karê me, lê bi israr û serkeftinênên em ê van astengiyan derbas bikin. Pêwîst e jinên Sûriyê asta têkoşîna xwe hîn zêdetir xurt bikin, da ku karbin mafê xwe di destûra Sûriyê a nû de misoger bikin."

### Projeyên Mecilsa jinên Sûriyê

Leyla Xalid di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Projeyên me weke Mecilsa jinên Sûriyê komxebat, semîner, panêl, rûnştin û civîn in. Herwiha projeyên me yên dema pêş jî pêşxistina jin di alî aborî û siyasî de ye. Me hejmarek ji projeyên xwe dane komîteya aborî, da ku em hêd hêdî jinê di aliyê aborî de li pêşbixin. Di heman demê de, perwedeyên me yên ji bo jinan berdewam bikin. Ev perwerde jî fikrîne, da ku jin di aliyê fikir, siyasî û dîplomasî de pêş bikeve."

### Meclisa Jinên Sûriya sîwaneke ji bo hemû rêxistin û komeleyên jinê ye

Rêvebera Mecilsa Jinên Sûriyê ya Ofîsa Helebê Leyla Xalid axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Mecilsa Jinên Sûriyê sîwaneke ji bo hemû rêxistin û komeleyên jinê ye. Ev yek vîn û hêza jinan xurtir dike, di heman demê de dengê jinê xurtir dike. Banga min ji jinên Sûriyê re ew ku em hemû bi hev re bi rengê xwe dengek bin, da ku em karibin li hemberî vê hişmendiya radîkar li berxwe bidin. Herwiha da ku em karibin Sûriyeke demokratîk, nenavendî û wekehev ku mafê hemû pêkhateyan û bi taybetî mafê jinê di nava xwe dihewîne, ava bikin."

# Di nav qutiyên sebzeyan de zincîrên hewcedariyê dişkîne û li pêşerojek çêtir digere

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Li bazareke sebzeyan a qerebalix li bajarê Qamişlo ku dengê firoşkaran tevlihev dibe, Ebîr El Elî xwediya temenê 23 salî li pişt erebeyek tijî sebzeyên cûrbecûr radiweste. Rûyê wê ji westandinê zer e, lê çavên wê bi biryardariyek dibiriqin ku temenê wê yê ciwan vedişêre.**

Çîroka Ebîr El Elî çîrokên bi hezaran keçan vedibêje ku ji ber şert û mercên dijwar ên aborî neçar ma ne zû bikevin bazara kar. Ku ew ji mafên herî bingehîn ên zarokatiyê bêpar in. Lê Ebîr, tevî her tiştî, israr dike ku hêvî qet namire.
Ne hilbijartina wê bû ku li wir di nav mêran de bixebite, lê xizantiyê ew neçar kir ku dev ji dibistanê berde û bikeve bazarê da ku alîkariya malbata xwe bike. Piştî mirina bavê xwe debara xwe misoger dike. Ew ji mafên herî bingehîn ên zarokatiyê bêpar ma û li herêma me ya belengaz sêwî bê war in. Lê Ebîr El Elî, tevî her tiştî, israr dike ku hêvî qet namire. Ew qet xeyal nedikir ku ew ê ji kursiya xwe ya li dibistanê derkeve û li vir di nav mêran de bisekine, bihayê biqîre û giraniya qutiyan hilgire. Lê mirina bavê wê du sal berê ew neçar kir ku bi berpirsiyariyên ku ji kapasîteya wê



wêdetir in re rû bi rû bimîne.

### 'Bazar dijwar e, lê heke hûn nexebitin, çawa debara jiyana xwe bikin'

Ebîr El Elî roja xwe bi hilatina rojê dest pê dike, sandûqên giran hildigire û sebzeyan bi baldarî rêz dike, hewl dide ku wan bi awayekî rêz bike ku xerîdaran bikişîne, ew bi kenek dudilî dibêje: "Bazar dijwar e, lê heke hûn nexebitin, çawa debara jiyana xwe bikin".
Karê li sûkê ji bo keçek temenê wê ne hêsan e, atmosfer dijwar e, deng bilind e û hin rêwiyên ku di rê de derbas dibin şîroveyên bêrehm dikin. Lêbelê, ew hewl dide ku van hemû zextan bide aliyekî, tenê balê dikişîne ser firotin û qezenckirina pereyên têr ji bo dabînkirina lêçûnên malê.
Tevî berpirsiyariyên xwe, ew hîn jî xwe dispêre xewna xwe ya kevin, vegera dibistanê û temamkirina xwendina xwe. Wê bi dengekî lawaz got: "Her roj ez keçan dibînim ku diçin dibistanê û zanîngehê, xwezî ez bikarîbam bi wan re bûma, lê divê ez bixebitim da ku debara jiyana xwe bikim û bikaribim jiyanek bi rûmet bijîm."

### Çîroka wê gelek çîrokên jinên Sûriyê vedibêje

Çîroka wê jî ne îstîsna ye. Gelek keç li Sûriyeyê, bi taybetî li deverên ku ji xizanî û bêkariyê dikişînin, di temenê ciwan de neçar dimînin ku bikevin bazara kar. Ew li bazar, kargehên piçûk, an jî li malan dixebitin, ji mafê xwe yê perwerde û zarokatiyê bêpar dimînin.
Kar li sûkê ne tenê westandina fîzîkî ye, lê di heman demê de ceribandinek rojane ya îrade ye. Di nav qerabalix û deng de, di nav awirên matmayî û carinan jî dilovaniyê de û di nav fikara dabînkirina debara jiyanê de, ew berî wextê xwe mezin dibe. Bi kenekî sivik got: "Carinan ez hîst dikim ku ez bûme jineke mezin, ne keçeke biçûk, lê dibe ku ev yek min bihêztir kiribe."
Tevî dijwarbûna rewşa xwe, Ebîr El Elî hîn jî bi têlek zirav a hêviyê ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê, çîroka Ebîr El Elî şahidiya rastiyek tal dimîne, lê bi biryardariyê tije ye, ji ber ku keç ji xwendekarên piçûk ên dibistanê di nav xizaniyê de vediguherin pişta malbatên xwe. Ew xemên ji temenê xwe mezintir li ser milên xwe hildigirin û xewnên paşxistî li benda şansek ji bo ji nû ve jidayikbûnê ne.

## Ji Pênûsa Jin

### Çareserî ji saziya malbatê rizgarkirin e

**Nehîr Pale**

Saziya malbatê di serê jinê de gelekî mezin dikin, wê tînin rewşeke ew bê malbatê nikare jiyana xwe berdewam bike. Eger dûrî malbatê bikeve xwe hîs dike ku wenda bûye, lawaz dikeve û bêçare dimîne. Gelek sedem hene ku jin dighîje vê rewşê, ya sereke jî malbat pîroz kirin. Malbat gihîştiye asta pîroz tê dîtin û bi riya wê hebûna xwe diyar dikin. Jineke ku bizewicê û zarokan bîne mîna ku di nava civakê de hebûna wê heye, mêr jî bi heman awayî difikire. Jin û mêr eger nezewicin û zarokan neyînin mîna ku di nava civaka xwe de hebûna wan tine ye. Malbat pîroz kirine û kirine çavkaniya hebûn û tinebûna ferd. Mîna ku bi çîkirina malbatê re wê hemû pirsgirêkên jin û mêr çareser bibin. Eger pirsgirêkên jin ên tendurûstiyê derbikevin xwe tavêjê hembêza malbata xwe, eger pêdiviya wê çêbibe berê xwe dide malbata xwe. Li gorî jin difikire di dunyayê de tenê malbat û xwedayê wê heye. Piştî ku dizewicê êdî dunyaya wê tenê hevjîn û zarokên wê ne. Jin zincîrên ku civaka zayendperest li derdora wê badane, hîs nake û nabîne. Xweşî û nexweşiyê bi rewşa malbata xwe ve dide girêdan, ji bo wan dijî û bê wan mirin jê re çêtir e.
Di wextê ku jinê çarenûsa xwe bi malbatê ve da girêdan êdî dawî li hebûna xwe tîne. Çiqasî ji jinê re were gotin malbat sedema kuştina te ye, wê qebûl neke, ji ber ew wisa nafikire. Bav û dayîka wê çiqasî xirabî lê kiribin dîsa wê hewl bide ku ew jê razîbin û wê efû bikin. Jina bi vî awayî bifikire di nava koletiyê de fetisî ye. Wê her tim pişta xwe bide derdora xwe, nebe hêza çareseriyê û serê xwe bitewîne.
Jin wexta tenê bifikire çawa malbata xwe razî bike, wê jêre dem nemîne ku li ser tiştekî dîtir bifikire. 24 saetan dikare li ser gotin û nêzîkatiyên malbat û civakê jêre kirine, bifikire û êşa wê bikşîne. Ev yek mejiyê wê kilît dike, wê nikaribe li ser mijarên cûdatir bifikire, yan agahiyên nû li gel wê çêbibin da ku mejiyê wê fereh bibe û dilê wê mezin bibe. Ji xwe civaka zayendperest destûr nade jinê ku ji derveyî malbata xwe bi kesekî re bide û bistîne yan jî têkeve nava civakê de. Heyanî ji wan tê derdora jinê asê dikin û wê dûrî her tiştî dihêlin.
Malbat di bin navê parastinê, exlaq, şeref û namûsê de jinê tîne rewşa ku di jiyanê de kor be. Rê û rêbazên çavên wê li dunyayê vebin pêre nadin bikar anîn. Di lîstokan, xwarin û vexwarinê, li malê, dibistanê û heyanî zanîngehan sîstemeke ku jinê her tim dûrî heqîqetê bimîne, çêdikin. Jina li hemberî sîstema wan daniye derbikeve, dawiya wê kuştin û tine bûne. Li ser asta cîhanê niha bi hezaran jin di girtîgehan de ne ji ber li hemberî sîstema civaka zayendperest derketin e. Heyanî ji wan tê lêgerînên jinê yên heqîqet û azadiyê ziwa dikin. Di bin navê exlaq de nirx didin jinên ku li gorî pîvanên wan danîne, tevdiger e.



# Navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê

Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Amûdê bi armanca pêşxistina xebatên çandî û hunerî di dawiya sala 2012'an de hate avakirin û di navendê de gelek kom jî cihê xwe digrin.

**Diyala Nidal\Qamişlo**

Li her derê cîhanê mirov bi çand, huner û nasnameya xwe tê naskirin û xuyakirin. Lê pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikirin, bi taybet gelê kurd ji ber qedexeya li ser çand û hunera wan, ji xebatên çandî û hunerî hatibûn dûrxistin û xebatên ku dihatin kirin jî bi rengekî veşartî dihatin meşadin. Herçiqasî zextên desthilatdaran li ser çand û hunerê hebûn jî, lê gelê kurd heta astekê hebûna çand û hunera xwe parast. Bi çiroska şoreşê re pêşketin di hemû daqan de pêkhat. Yek ji qadên herî bi bandor û xwedî rol di belavkirina ruhê şoreşgerî de qada çand û huner bû.
Di derbarê xebat û pirojeyên navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê, endama koma Agirî Lîlav Mensûr ji Rojnameya me re axivî.

### Kar û xebatên navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê

Lîlav Mensûr da zanîn ku navenda Çand û huner a bajarê Amûdê bi



armanca pêşxistina xebatên çandî û hunerî di dawiya sala 2012'an de hate avakirin û wiha got: "Kar û xebatên navenda Çand û Hunerê ya bajarê Amûdê di asteke baş de têne meşandin. wek navenda çand û hunera Amûdê em gelek xebatên pîroz didin meşandin û bi hemû şahiyên li bajarê Amûdê radibin û komên me piranî erkên ku dikevin ser milê wan di van şahiyan de pêktînin. Di heman demê de, gelek kom cihê xwe di nava navenda çand û huner a bajarê Amûdê de digrin."

### Gelek kom cihê xwe di navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê de digrin

Lîlav axaftina xwe wiha berdewam kir: "Di nava navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê de, gelek kom cihê xwe digrin, mîna koma Şehîd Rîhan a Dayîkan û di nava vê komê de nêzî 20 dayik cihê xwe digrin. Ev dayik da ku kevneşopiyên bajarê Amûdê û herêmê winda nebe, her di nava kar û xebatê de ne. Herwiha Koma şehîd Rîhan jî vê erkê pêktîne û ew komeke xweser e. Koma Agirî gelek berhemên wê hene û ew duyemîn koma ku Rêber Apo avakiriye. Beşê yekem ê koma Agirî li Helebê ye û li Amûdê jî Koma Agirî kar û xebatên xwe dide meşandin."
Endamên koma şehîd Agirî ji destpêka şoreşê ve cihê xwe di nava kar û xebatê de digre û nêzî 13 endamên xwe hene; ev kom her û her li pêş dikeve û di heman demê de bi stranên xwe navdare. Koma Agirî di destpêka şoreşê de bi hemû rola xwe radibû, lê niha piraniya xwe di nava muzîkê de cih digirin, ji ber ku niha beş hatine berfirehkirin. Koma şehîd




Delîla ya xweser jî, endamên wê di navbera 10 heyanî 15 endaman e. Koma wêne jî 20 şagirtên xwe hene. Koma şehîd Yusra ya Şano ew jî xweser e, bi kar û xebatên şanoyê ve mijûl dibe. Koma Şehîd Mizgîn a Dîlanê ya giştî jî cihê xwe di nava çand û hunera bajarê Amûdê de digir e. Ev kom jî koma govendê pêk, 6 jin û 6 mêr cihê xwe têde digrin. Endama koma Agirî Lîlav Mensûr axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di vê salê de zarokên li gel me tevlî Festîvala zarokan a li bajarê Rimêlanê bûn. Herwiha koma Şehîd Rîhan a dayîkan, tevlî festîvala Şehîd Ronahî ya bajarê Qamişlo bû. Herwiha wê di meha kanûnê de festîvala Orkêş ya girêdayî koma muzîkê were lidarxistin, komên me jî wê tevlî bibin. Banga min ew e, ku civak û bi taybetî ciwan xwedî li çand û hunera xwe derkevin, ji ber ku civak bi çand û hunera xwe tê naskirin."

# Peymangeha Orkêstra ruhê muzîkjeniyê di dilê zarokan de diçîne

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Zarokên ku di Peymangeha Orkêstra de xwe fêr dikin dest nîşan kirin ku mamosteyên muzîkê wan bi rêbazekî hêsan fêrî amûrên muzîkê dikin, hem jî piştgiriya wan dikin, da ku hîn bêtir xwe di warê muzîkê de li pêş bixin.**

Peymangeha Orkêstra Rojava ya Zarokan di sala 2016'an de hate avakirin, ew girêdayî Desteya Çandê ya kantona Cizîrê ye. Ev peymangeh bi rêbazekî nûjen zarokan fêrî stran û hemû cûreyên amûrên muzîkê dike.
Amûrên ku zarok li ser wan tên fêrkirin nêzî 16'an e, ji wan jî tembûr, sêtêl, viola, erbane, keman sentore, ûd, kilarînêt û hwd…
Di Peymangeha Orkêstra de 8 mamosteyên pispor ên fêrkirina stran û muzîkê hene û ew nêzî 50 zarokên ku temenê 8 salî heya 18 salî ye bi awayekî rojane fêr dikin.
Ilyan Hemo, Baran Cumaa û Sîlva Cemo sê zarok in ku li ser amûrên muzîkê ji hêla peymangehê ve tên perwerdekirin. Derbarê hunera



Ilyan Hemo



Baran Cuma



Sîlva Cemo

muzekjeniyê Ilyan, Baran û Sîlva ji rojnameya me re axivîn.

### 'Ji 10 saliya xwe ve min rahiştiye defê'

Ilyan Hemo dest nîşan kir ku wê ji 10 saliya xwe ve dest bi jenandina defê kiriye û wiha got: "Ez Ilyan Hemo, ji Qamişlo me, temenê min 12 salî ye. Ji ber ku min gelekî ji muzîkê hez kir, dema ku temenê min 10 salî bû bavê min defek ji min re anî. Herwiha berî salekê ez tevlî perwerdeya defê bûm li Navenda Orkêstra. Ez perwerdeya xwe ya dibistanê didomînim û hem jî perwerdeya defê dibînim. Wekî tê zanîn niha bêhnvedana xwendinê ye, ez dema xwe ya vala bi muzîkê derbas dikim, lê dema ku dibistan dest pê dikin ez dema xwe bi rêxistin dikim da ku bikaribim hemahengiyê bixim navbera muzîk û xwendinê. Mamosteyên me bi rêbazekî hêsan me fêrî lêdana amûran dikin û gelekî bi me re alîkar in. Berî salekê ez ne bisporbûm di jenandina amûra defê de, lê di roja îro de heya radeyeke baş ez defê bi kar tînim. Hunermend û muzîkjenê ku ez jê hez dikim, Mehmûd Berazî ye, ew dibe apê min û ez dixwazim bibim mîna wî."

### 'Xewna min e ku bibim muzîkjenekî navdar'

Baran Cumaa anî ziman ku xewna wî ew e ku bibe muzîkjenekî navdar li ser asta Kurdistanê û wiha domand: "Ez ji bajarê Qamişlo me, di sala 2013'sn de ji dayik bûme. Di 5 saliya xwe de min gelekî ji muzîkê hez dikir, rojekê ez çûm ahengeke hunerî û ez bi muzîkê ve hatime girêdan. Ev sê sal in ku ez tevlî Navenda Orkestra Rojava ya Zarokan bûme. Di destêkê de min xwe li ser amûra tişêlo fêr dikir, lê paşê min amûra defê bijart. Em roja yekşemê perwerdeya xwe ya defê dibin û li mal jî xwe perwewerde dikin hem jî dibistanê didomînim. Li dibistanê jî waneyên metriyala muzîkê tên dayîn, lê guhdaneke mezin bi hunera muzîkê ya kûr nayê dayîn. Bi dirêjahiya salekê ez baş fêrî defê bûm, carcaran ez şûna mamoste digrim û hevalên xwe perwerde dikim. Di dema heyî de astengî dernakevin pêşiya min, lê di rojên pêş de tekez e ku wê çêbibin û ez ê jî wan derbas bikim da ku bibim muzîkjenekî navdar li ser asta Kurdistanê."

### 'Xwesteka min ew e ku gîtarê bijenînim û stranan bêjim'

Sîlva Cemo da zanîn ku hêviya wê ew e gîtarê bijene û pê re stranan bibêje û wiha qedand: "Ez di sala 2010'an de li Helebê ji dayik bûme û ji Efrînê me, piştî dagirkirina Efrînê û bi darê zorê em ji warê xwe hatin koçberkirin, ez û malbatê hatin Qamişlo. Ev salek û nîv e ku têm Peymangeha Orkêstra. Hemû amûrên muzîkê zehmet in ku mirov xwe fêr bike, gîtar jî wiha ye, lê eger vîn û xwesteka mirov hebe ew ê fêr bibe. Min gelekî zehmetî dîtin di destpêka ku min rahişt gîtarê, lê min xwe li pêş xist, niha bi hêsanî gîtarê dijenînim, xwesteka min ew e ku stranan li gel gîtarê bibêjim. Ez gelekî ji hunermend Dîno hez dikim, ji ber wê jî stranên wî dibêjim û pêre gîtarê dijenînim. Ez niha xwe fêrî lêdana defê jî dikim, li aliyê din jî ez xwendina xwe berdewam dikim, ez dema xwendinê û rahênanan li ser gîtarê jî dikim. Em weke malbat bi giştî ji muzîkê hez dikin, em çar xuşk û bira ne, em hemû li amûrên muzîkê didin."

# ‘Dagirkeriya Tirk dixwaze bi talankirina şûnwaran dîroka Efrînê winda bike’

Endamê Meclisa Bilind a Şûnwarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selah Sîno destnîşan kir ku bi talankirina şûnwarên Efrînê dewleta Tirk zagonên navneteweyî bin pê dike û wiha got: “Dagirkeriya Tirk dixwaze bi talankirina şûnwaran dîroka Efrînê winda bike.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**


Dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê 8 sal in li Efrîna dagirkirî bi tevahî rêbazan sûcên dijmirovî pêk tînin. Sûcên kuştin, revandin, destdirêjiya li dijî jin û zarokan, qirkkirina xweza , guhertina demografîk û talankirina şûnewaran li Efrîn bênavber dewam dike. Ji destpêka dagirkirina Efrînê û heta vê kêliyê hedefgirtin û talankirina şûnwaran bi awayekî sîstematîk li Efrînê tê meşandin û tevahî cîhanê çavê xwe ji van kiryarên dijmirovî digrin.

Derbarê mijarê de endamê Meclisa Bulind a Şûnwarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selah Sîno ji Rojnameya me re axivî.

Selah Sîno diyar kir ku ji destpêka dagirkirina Efrînê ve gelek binpêkirin derheqê cihên arkolojîk û şûnwarên kevnar e hatin kirin û wiha got: “Têkbirina şûnwaran û cihên arkolojîk ji destpêka şerê li Efrînê ve ketibû pilana dewleta Tirk de, balafirên şer ên dagirkeriya Tirk Perestgeha Eyn Dara ku dîroka wê vedgere 1200 sal B.Z û di sala 1956’an de hatibû vedîtin, kirin armanc û parêstgeh ji sedî 60 hilweşiya. Me di wê demê de ev kiryarên hovane belge kirin û ji Saziyên taybet ên Parastina Mîratên Çandî û Mirovahî weke UNESCO û Komîteya Lêpirsîna Navdewletî ya têkildarî Sûriyê şand. Mudîriyeta Parastina Şûnwaran a Efrînê ev sûc di raghandina herêmî û navdewletê de parve kir û weke sûceke şer li dijî mîrata çandî ya mirovahî wesf kir.”

**Bajarê Sîros (Nebî Horî)**

Selah Sîno wiha domand: “Bajarê Sîrosê (Nebî Horî) jî bi hemû cûreyên çekan hate bombebarankirin, heriwha di çarçoveya êrişên leşkerî de Girê Cindrêsê yê dîrokî bi sedê mûşekan û bombeyan hate hedefgiertin, Desteya Şûnwaran ya Efrînê dosyaya binpêkirinên şûnwar û mîratên çandî û mirovahî piştî dagirkeriyê nesekinand û şopandina wê berdewam bû. Bi awayekî sîstematîk dewleta Tirk a dagirker ji bo pêkanîna sûcan li dijî cihên



dîrokî, olî û şûnwaran tîmên taybet ava kir, lê vê carê bi riya kolandina bi alavên giran, hilwişandin, şewitandin, talankirin û dizîna şûnewarên di van cihên dîrokî û arkolojîk bû, herwiha veguheztina şûnwaran dervî welat di riya Tirkiyê de, da ku di bazara reş a cîhanî ya bazirganiya şûnwarên mîratî yên kevin de, bên frotina.”

Pêvajoya berovajîkirina rastiya şûnwarên arkolojîk

Selah Sîno destnîşan kir ku dagirkeriya Tirk bi awayekî rasterast pêvajoya berovajîkirina rastiya şûnwarên arkolojîk bi hinceta sererastkirina cihên arkolojîk û şûnwaran pêk anî û wiha lê zêde kir: “Tevî ku qanûna navdewletî qebûl nake ku desthilatdariya dagirker bi tu pêvajoyên kolandin, veguhestin û sererastkirinê pêk bîne di herêma dagirkirî de, lê belê dagirkeirya Tirkiyê hemû binpêkirinên der heqê dîrok û şûnwarên herêma Efrîna kurdî de pêk anî, ev sûceke dijî mirovahiyê ye li gorî UNESCO’yê ku divê hemû civak parastina şûnwarên mîratî bikin da ku ji nifşekî bidin nifşê din, lê Tirkiyê berovajî vê yekê kir û hîn jî berdewam dike.

Li hember vê rastiya dijwar, bêdengiya navdewletî, hevkariya veşartî ya rêjîma berê û redkirina vekirina dozekê li dijî Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê, weke Desteya Şûnwarên Efrînê tiştê ji destê me dihat tenê belgekirina van sûc û binpêkirinan bû bi delîlên zanistî ji wêne, vîdyo û şahîdan ji hundirê herêmê, herwiha vekirina kenalên danûstendinê bi Komîteya Lêpirsîna Navdewletî ya têkildarî Sûriyê, UNESCO’yê û rêxistinên civaka sivîl ên ku bi parastina mîratên çandî û miorvahî mijûl dibin, mijarên ku hatin belgekirin hatin şandin, weke doza pêkanîna binpêkirina li ser dîrok, şûnwar û mîratên Efrînê yên madî û nemadî di çend raporên Komîteya Lêpirsîna Navdewletî de hate eşkerekirin.”

**‘Di kongreyên navdewletî de binpêkirin hatin eşkerekirin’**

Selah Sîno da zanîn ku Desteya Şûnwarên Efrînê ev binpêkirin di riya pêşengehên wêneyan, semîner û kongreyên herêmî û navdewletî de eşkere kir û wiha got: “Detayên ku bal dikşîne li ser sûcên dagrkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê der heqê dîrok, şûnwar û mîrateya herêmê li ser raghandinê eşkere bû. Desteyê 80 cih û girên arkolojîk, zêdetirî 30 mezarên olî yên muslimanên sune, elewî û Êzdî beleg kir, ev hejmar ne sabîtin ji ber ku me nikarîbû xwe bighêjînin an jî belgeyên zanistî yên taybet bi êrişên binpêkirin û hilweşînan bidest bixin, herwiha belgekirina gelek rewşên guhertina cihên erdnîgarî, gund û qadên bi navê kurdî bûn veguhrandin nîşaneyên Tirkî, belgekirina zordariya der heqê gelê Êzdî û neçarkirina wan ku ola Îslamê hilbijêrin di riya hilweşandina cihên wan ên pîroz, avakirina mizgeftan û peymangehên fêrkirina ola Îslamê ji bo wan.”

**Armancên dewleta Tirk li pişt wêrankirina şûnwarên arkeolojîk**

Dewleta Tirk ji destpêka damezirandina wê tirsa ji civakên resen dijî, ku di riya komkujiyên komî ev civak hilwişand, ji ber ew hêzeke dagirker e lewma hewil dide ku van civakan bitepisîne di nava civaka Tikriyê de, di çarçoveya hedefgirtina çand, mîrate, dîrok û şûnwarên wê. Armancên hilwişandina şûnwarên arkolijîk li çiyayê Kurmênc bi awayekî sîstematîk di çend xalan de tê zelalkirin:

1-Hilwişandina civaka Kurd ya herî zêde di Sûriyê de bi kurdetiyê girêdayî ye weke herêma Çiyayê Kurmênc(Cebel El- Ekrad) ku rêjeya gelê kurd ji şêniyên Efrînê dighaşt ji sedî 98 berî dagirkirnê û yên din ereb bûn bi awayên cuda derbasî herêmê bûn.

2-Jêbirin, xirabkirin û teşhîrkirina herêmê di riya êrişa li ser tovên şaristaniya herêmê û hilwişandina jîngeha arkolijîk da nivîsandina dîrokek nû ji bo tirkkirina herêmê, ku xwe dispêre şûnwarên ku rastiya wê berovajî kirin û teşhîrkirin, ji ber ku nivîsandina dîrokeke belgekirî xwe dispêre li ser şûnwarên hatin keşifkirin û bermahiyên madî ji komkirinên nifûsê. Dewleta Tirk hewildanên xwe kir ji bo rastiya tirkirinên jî bixe cihê gorîstana Nebî Horî li Sîrosê.

3-Bi wêrankirin û hilweşandina deverên arkeolojîk û mîratî yên ku ji hêla aborî ve sûdmend in xwest derbeyek aborî lê bixe. Tirkiye baş dizane ku geşbûna geştiyariyê tê çi wateyê, ku mîna petrolê ye, lê sûdmendtir û bê zirartir e.

4-Bêparkirina herêmê ji cihên navneteweyî yên wekî Perestgeha Eyn Dara, Şikefta Dodariyê, Dêra Sema’n û cihên arkeolojîk ên Bradê, ku tê de bermahiyên Qedîs Mar Maron, bavê civaka Maronî heye. Brad ji destpêka sedsala bîst û yekê ve bûye cihekî ziyaretê ji bo civaka Maronî.


5-Bandorkirin li ser pîskolojiya nifûsa xwecihî û têkbirina moralê wan bi rêya hilwişandina şûnwarên wan ên pîroz, kevnar û dîroka wan û berê wan bidin koçberkirina bi darê zorê ve ji bo amadekirina pêkanîna pêvajoya guhertina demografîk.

**‘Bi zanistî û sîstematîk hin cih nehatine kolandin’**

Selah Sîno tekezî kir li ser pêwistiya balkişandina li ser dosyaya şûnwar, mîrateyên dîrokî, projeyên parastin û sererastkirinê û wiha anî ziman: “Divê piştgirî bê dayîn ji bo rêveberiyên Şûnwaran li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, beşeke vê pisporiyê di peymangeh û zanîngehan bê vekirin, bi armanca avakirina tîmeke zanistî ku bi jîngeha arkolojîk re mijûl bibe, ji bo danasîna civakên herêmî li gorî giringî û sûden wê, êdî dibe alîkar di bilindkirina statuya civakan û baştirkirina asta wan a çandî, civakî, aborî û şaristanî di nav civakên cîran de, bi rêya geştiyariyê û têkiliya bi civakên pêşketî re, geşbûna hunerên destan û mîrata dîrokî.

Divê xebat ji bo vekirina dozên qanûnî li dijî dewleta Tirkiyeyê li dadgehên herêmî û navneteweyî û daxwaza tezmînatê ji bo herêma ku şûnwar û mîrata wê hatiye wêrankirin; bê kirin.”

Endamê Meclisa Bulind a Şûnwarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selah Sîno wiha gotinên xwe qedand: “Cihên arkolojîk ên ku hatine wêrankirin û talankirin li seranserê herêma Efrîn belav bûne, piraniya van cihan bi awayekî zanistî û sîstematîk jî nehatine kolandin, ji bilî cihên Eyn Dara, Şikefta Dodaryayê, Sîros (Nebî Horî), cihê arkeolojîk ê Girê Cendêris û Brad. Ji bilî cihên arkeolojîk, her malek li Efrînê rastî talankirin û dizînê hatiye, bi taybetî dizîna amûrên sifir ên kevin û firotina wan ji aliyê komên çekdar ên girêdayî dewleta Tirk ve û heta alavên hin mizgeftên kevin ên wekî xalîçe û sifir jî ji xerabiyê wan xilas nebûne.”



**Xwenasîn**



## Avakirin û Parastina Civakê

**Rohat Bulut**

Di sêzdeh salên dawî de, gelê Kurd û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ezmûnek veguherîna civakî derbas kirine ku dikare ji bo dîroka mirovahiyê bibe mînak. Ev ezmûn bi navê Rojava tê binavkirin. Ew ne tenê pênaseyeke erdnîgarî ye, lê di heman demê de felsefeyeke jiyanê ye ku li ser hêza xwerû ya gel hatiye avakirin, modeleke berxwedan û avakirinê ye. Di dilê vê modelê de ji nû ve avakirina civakê, pêşeroja gel, xwe parastin û daxwaza wan a statuyê heye.

Pergala ku li Rojava pêşketiye modelek jiyanek alternatîf a li dijî pergala dewletê ye. Li dijî yekperestiya dewletê, gelê herêmê bi rêya meclisên xwe yên komîn û saziyên xwerêveberiyê, pratîka Xwerêveberiya Xweser nîşan didin. Ev pergal ne tenê ji bo gelê kurd, lê di heman demê de ji bo gelên ereb, asûrî, ermenî û gelek civakên baweriyê yên din ên mîna dursî û elewî jî bingehek hevpar peyda dike. Yekîtiya çandî ya ku di navbera bawerî û gelan de hatiye avakirin, piraliya dîrokî ya herêmê ji nû ve derdixe holê.

Xwe parastin yek ji kevirên bingehîn ên vê pergalê ye. Xwe parastin ne tenê berxwedana çekdarî ye, lê di heman demê de tê wateya parastina nirxên çandî, bîra civakî û jiyana hevbeş jî. Civak tenê dikare bi avakirin û parastina saziyên xwe nirxên xwe biparêze. Hêzên parastinê bi xwe jî çarenûsa civakê temsîl dikin. Heke civak çiqasî xwedî hêzeke cewherî ya xweparastinê be, bi komîn û meclisê xwe hebûna xwe biparêze û pêş ve bibe dê çarenûsa pêşeroja xwe jî misoger bike.

Di vê çarçoveyê de, mijara statûyê pir girîng e. Gelê kurd û civakên din ên li herêmê ne tenê nasnameya xwe nas dikin, di heman demê de mafê avakirin û parastina pergalên xwe jî dixwazin. Statû, rûmet û pêşeroja gel e. Gelekî bê statû, hem ji hêla fîzîkî ve û hem jî ji hêla çandî ve, lawaz e. Ji ber vê yekê, mafê parastina gel, bi mafê hebûn û statûya gel ve girêdayî ye.

Parastina civakê divê ne tenê li dijî gefên derve, lê di heman demê de li dijî bandorên navxweyî û dejenerasyonê jî were kirin. Parastina nirxên civakî li dijî bandorên takekesî, bazirganî û wêranker ên modernîteya kapîtalîst girîng e. Ev nirx jiyana hevbeş, parvekirin, hevgirtin, azadiya jinan, hesasiyeta ekolojîk û mekanîzmayên biryardana demokratîk dihewîne. Parastina van nirxan tê wateya parastina pêşeroja gel.

Yek ji aliyên herî berbiçav ên pergala ku li Rojava hatiye damezrandin beşdariya rasterast a gel di rêveberiyê de ye. Ji endamên meclisên taxan bigire heta endamên meclisên herêmî, gel mijarên pêvajoyên biryardanê ne. Ev ne tenê baweriya gel bi xwe zêde dike, lê di heman demê de aîdiyeta civakî jî xurt dike. Gel dibe aktorên ku ne tenê rêveberiyê dikin, di heman demê de diparêzin û ava dikin.

Îro, Rojava ne tenê ji bo gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, lê ji bo hemû bindestan, yên ku nehatine dîtin û kesên ku xeyala aştiyê di navbera gel û baweriyan de dikin, çavkaniya îlham û sûdwergirtinê ye. Em dikarin bêjin, mafê diyarkirina çarenûsa gelan mafê avakirin, parastin û pêşxistina pergalên xwe ye. Ev maf gerdûnî ye û ji bo her civakê ji bo pêşerojek bi rûmet girîng e. Modela ku li Rojava hatiye damezrandin nîşan dide ka ev maf çawa dikare di pratîkê de gengaz bibe. Serkeftina vê modelê dê ne tenê ji bo gelê kurd, lê ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn û cîhanê jî çavkaniya hêviyê be.



# ‘Erdogan tu encam ji hevdîtinên li Netewên Yekbûyî negirtin’

Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd da zanîn ku Amerîka dixwest bazareke aborî bi Tirkiyê re pêk bîne, lê rewşa aborî ya Tirkiyê lawaz e û got, “Eger gef û êriş li ser herêma me bidomin wê Peymana 10’ê Adarê û pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk têk biçin, wê herêm û cîhan tev pê bandor bibe.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Hevdîtina Erdogan bi Trump re û bazarên ku di navbera wan de tên kirin, hem jî rewşa Sûryê, têkiliyên di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta veguhêz de, herwiha gef û êrişên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên domandin hemû bi hev ve girêdayî ne. Derbarê heman mijarên derbasbûyî hevserokê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn hevdîtina Erdogan û Trump çawa dinirxînin û ev hevdîtin wê bandoreke çawa li siberoja Sûriyê bike?**

Wekî ku diyar dibe, helwesta Erdogan û siyaseta Turkiyê bi giştî li beramberî siyaseta rêveberiya Amerîka lawaz e. Pir hewil dan ku di van civînên Netewên Yekbûyî de piştgirtiya rêveberya Amerîka, bi taybet jî ya Trump, ji bo xwe bigrin. Xwestin di derbarê hin mijaran de weke taiwîzan bigrin, weke Sûriyê û Bakur û Rojhelatê Sûriyê. Ji ber ku Turkiyê dixwaze di mijara Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bêhtir bi bandor û bi hêz be. Lê di vê derbarê de, weke tê famkirin, encamên ku Erdogan dixwest negirtiye, ji ber ku êdî armanca siyaseta rêveberya Amerîka di Sûrî û Bakur û Rojhelatê Sûriyê de cûda bûye û hatiye guhertin, nema weke dema rêjîma Baas ya berê ye. Lewra, ew ê zû bi zû tawîzan ji Turkiyê negirin. Helwest hene ku çawa bandora Turkiyê li Sûriyê kêm bibe, ji xwe Israyîl bi rêveberya Amerîka re li ser vê yekê gelek dixebite, ku naxwaze gefên Turkiyê û hêza wê di sûrê de zêdetir pêşbikeve.



Lewma, encamên ku tên xwestin di vê mijarê de nehatine girtin. Berovajî wê, rêveberya Amerîka hinek mijarên dîtir li ser Tirkiyê û Erdogan ferz dike, ev jî ku çawa ji Rûsya dûr bixîne, ew rêkeftinên ku berê bi Rûsya re çêkirine, weke rêkeftina gazê, fişarê li ser dike ku gav jê paş de bavêje, herwiha mijara fûzeyên S-400 û vegerandina wan. Rêveberya Amerîka fişarê dike ku di navbera Tirkiyê û Rûsya de valahiyekê biafirîne, dixwaze encamekê di vê derbarê bi dest bixe. Di heman demê de diyar dibe ku Tirkiyê hinek hevpeyman îmze kiriye, ji bo mijara gazê, ev cardî Tirkiyê bi Rûsya re dixe pirsgirêkeke dîtir de. Wê helwest û siyasetên Rûsya di vî derbarî de werin şopandin, dibe ku nerazîbûnek pêş bikeve û bibe pirsgirêk heta di hundirê Tirkiyê û di navbera Erdogan û hevkarên wî de weke MHP û Bexçelî. Ew dixwazin ku bi Rûsya û Çînê re weke hevpeymaneke stratejîk çêbikin. Li aliyê din jî, Amerîka fişarê dike ku vê mijarê xera bike, hewildaneke Trump bi vî rengî çêbû da ku hevkarî di navbera Tirkiyê, Çîn û Rûsya de çênebe. Ji ber vê yekê dibe ku di hundirê Tirkiyê de, ku ji xwe krîzeke siyasî dijî, pirsgirêkeke cidî derbixîne. Ji ber vê yekê, ne zelal e ka ew ê çawa biryar bide û çawa tevbigere. Hat xwestin ku rêkeftina leşkerî bi Amerîka re pêş bixînin derbarê F16 û F35, lê tu pêşketin çênebûye. Ji ber ku rêveberya Amerîka di hinek majaran de ne bi biryar bû ku bide, tiştên ku Amerîka dixwaze li ser Tirkiyê di aliyê leşkerî de bike, ew e ku bikaribe ji Rûsya dûr bixe. Li ser vî esasî dixebite. Li aliyê din jî, Amerîka dixwest di mijarên aborî de bazarekê bi Tirkiyê re bike û pê re rêkeftinekê çêbike, ku bikaribe diraveke mezin jê bigre, wek ku çawa bi welatên Kendavê re kir. Lê belê Turkiyê hêza wê ya aborî ewqas nîne ku bi vî rengî rêkeftin û bazaran bi Amerîka re bike. Tirkiyê wisa di nîvê rê de dimîne, ti encamên ku Erdogan dixwest di van hevdîtin û danûstendinên xwe li Netewên Yekbûyî negirtine.

**Hevdîtinên di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta veghuzê de gihane çi astê û xalên dibin asteng çi ne?**

Gelek xalên ku dibin astengî di navbera me û hikumeta demkî ya Şamê de hene, ew xal hemû stratejîk û sereke ne. Xala herî girîng jî rengê pergala siyasî ya pêşeroja Sûriyê ye. Çiqasî em tekez dikin ku pêdivî bi rêjîmeke nenavendî heye ku pêşerojek baştir ji bo Sûriyê garantî dike, lê desthilata demkî israr dike ku sîstemek navendî were pejirandin ku desthilatdariyek yekane ji bo birêvebirina dewletê destnîşan dike. Xala din, mijara entegresyonê ye. Wek me anî ziman helwesta Şamê di mijara nenavendîbûnê de neynî ye, helbet ew di mijara entegresyonê de jî pirsgirêk û astengiyên cidî derdixin. Ew dixwazin entegresyon bi awayekî kesayetî çêbibe, ku her kes xwe disaziyên dewletê de bihelîne, bê ku ti taybetmendî, yan îrade û yan jî nasnameya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê nemîne. Em jî vê yekê qebûl nakin ji ber ku mijareke xeter e di vê dema hesas de. Ev alozî ji ber nebûna destûreke mayidne û qanûnî ku mafên gelê Sûriyê misoger bike, bi taybetî yên têkildarî QSD, hîn bêtir dijwartir dibe. Nabe ku ev pirsgirêk bi awayê ku niha tê pêşniyarkirin were çareserkirin, ji ber ku nabe şervanên QSD’ê çekên xwe deynin û wek kesayet tevlî artêşa Sûriyê bibin û hîn artêş bi xwe bi rêbazên rewa nehatiye damezrandin, ev pirsgirêkên cidî ne ku heta niha tu gav tê de nayên avêtin. Xala din jî girêdayî hin sozên ku desthilata demkî dabûn bi armanca avakirina baweriyê di mijarên: Îlana Destûrî ku qaşo hin guhertinan tê de çêkin, vegera xelkê Efrîn û Serêkaniyê û Girê Spî, mijara perwerdê û deriyên sînorî, hemû pêk nehatine û tu gav tê de nehatine avêtin û ev jî bêbaweriyê bi xwe re tîne.

**Armanc ji gef û êrişên ku tên kirin li ser herêmên Rêveberiya Xweser çi ye û kî li pişt van gef û êrişan disekine?**

Bi rastî ev gefên ku li ser herêmên me çêdibin, ji aliyê girûpên çekdar yên girêdayî Tirkiyê û gefên cûda yên ji aliyê desthilata demkî ya Şamê ve, ji xwe herî dawî aşkere bû, ku Tirkiyê jî heman zimanê tehdîdê bi kar tîne. Tê xuyakirin ku Tirkiyê li paş vê mijarê ye, ew van hêzan dehf dide ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dixwaze bi rêya gef, şer û provokasyonan fişarê li ser me çêke, da ku em radestî desthilata demkî ya şamê bibin, dev ji çek û destkeftiyên xwe berdin, lihevkirinekê wekî ku dixwazin bikin, dibe ji bo vê armancê hinek şerên herêmî derxin holê, alozî û fişarê bikin, bi rêya hinek eşîr û girûpên tûndrew û islamî pişt girtiyê didine wan, bixwazin vana pêş bixînin. Lê em dibêjin çêkirina aloziyeke wisa di vê demê de wê rewşeke pir nû çêbibe di Sûriyê û herêmê de, dê rewş hemû bê guhertin. Ji ber ku rewşa Sûriyê ne wekî berê ye, rewşa Tirkiyê jî ne weke berê ye, heta herêm bixwe jî hatiye guhertin, ji ber wê eger aloziyek wisa çêbibe, gerek bê zanîn ku wê her tişt wê serûbinî hev bibe. Êdî tu kes nikare behsa aramiyê û çareseriyeke nû bike, dê ev pêvajoya diyalogê ku me bi Şamê re destpê kiriye, ango lihevkirina 10’ê Adarê, dê têk biçe û bi dawî bibe. Herwiha, ji bo pêvajo Aştiyê û Civaka Demokratîk di hundirê Turkiyê de jî derbasdar e. Pêvajoya Aşîtiyê dê bidawî bibe û dê pêvajoyeke nû ji alozî û şer û gerîntiyê di hundirê Tirkiyê de dest pê bike. Lewma ev rewş dê tevahî cîhanê bandor bike, wê helwestin siyasî nû pêş bikevin, bi taybet ji bo Tirkiyê ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a ku li Tirkiyê ji hêla Rêber Apo ve hat destpêkirin û PKK’ê bersiv û biryarên dîrokî û startejîk di vêna de girt, ji bo çekdayînê û xwefesixkirinê, niha eger Tirkiyê van hemûyan red bike, dê pêvajoyeke şer bike. Di vî wextî de, yê ku aştiyê û çareseriyê asteng dike û ji diyalogan direve dê dewleta Turkiyê be û ew ê sûjdar bê dîtin û derkeve holê ku ew şer û alozî pêş dixe û piştgirtiyê dide terorê. Di vê derbarê de, ew berê jî bi vî rengî hatiye naskirin û gelek rexne li ser Tirkiyê hene. Ji xwe rewşek wiha dê herêmê giştî ber bi şer ve bibe.



**Riyên çareseriyê ji bo çareserkirina pirsgirêka Sûriyê çi ne?**

Çareseriya bingehîn ji bo pirsgirêka Sûriyê, ew e ku tevlîbûneke hemû gelên Sûriyê bi hemû netew, çand û baweriyên xwe, di nava pêvajoya siyasî de çêbibe. Bi hev re biryar bidin û pêşeroja xwe diyar bikin. Ji nûve gelên Sûriyê, kongireke niştimanî ya Sûrî li dar bixin, di vê kongirê de hineke encam derkevin. Li ser vê bingehê bikaribin encûmenek hikumî veguhêz çêbikin. Herwiha ji wê encûmenê weke komîteyeke jinûvenivîsandina destûrê demkî derkeve. Di heman demê de ji hikumetek û rêveberiyeke ku bi beşdarbûna herkesî derkeve, bi vî rengî pergala siyasî ya pêşerojê bê diyarkirin, bi îrade û biryara Sûriyê. Em hertim dibêjin, gerek pergaleke nenavendî hebe, ku bikaribe bi taybetmendiya hemû herêman mafên hemû pêkhateyan biparêze. Li ser vî esasî, gelên Sûriyê bikaribin bi hevre jiyan bikin, eger ev çênebin, ne mumkine gelên Sûriyê bi hev re, bi awayekî hevbeş bijîn. Tam berovajî wê, israrkirina di pergala navendî de, tê wateya israrkirina li ser di parçebûn û belavkirina Sûriyê ev jî nabe çareserî. Li ser vê bingehê, roj berî rojê, pêwîst e nerîn û dîtinên hemû pêkhateyên gelên Sûriyê, di çarçoveyekê siyasî de bibin yek, û li ser pêşeroja xwe biryar bidin ku çawa bi hev re jiyan bikin. Wisa dikarin bi hevre destûreke mayînde ya pêşeroja Sûriyê binivisînin û bi hev re bi karibin li hev bikin, ku çawa pergaleke nenavendî ava bikin. Em bawer in bi vî rengî çareseriyek demokrat û rast di hundrê Sûriyê dê pêk were.

# ‘Hikumeta veguhêz parçekirina Sûriyê qebûl kiriye’

Ji Navenda Kurdî ya Lêkolînan Dr. Tariq Hemo destnîşan kir ku zihniyeta Colanî olîgraş û cîhadîst e ku temenê wê ne dirêj e û got, “Hikumeta veguhêz rewşa parçekirina Sûriyê qebûl kiriye û dixwaze bi destê Tirkiyê Rêveberiya Xweser têk bibe”.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Hikumeta veguhêz di Sûriyê de tu gavavêtin û guhartinên ji bo çareseriya van pevçûnan qebpl nake, berûvajî wê parçekirin û dagirkeriya xaka Sûriyê ji aliyê dewleta Tirkiyê ve qebûl dike, lê demokratîkbûyîna Sûriyê qebûl nake. Girêdayî vê mijarê ji Navenda Kurdî ya Lêkolînan Dr. Tariq Hemo bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.



**-Gelo çi cudabûna hikumeta veguhêz a Sûriyê ji rêjîma Bass a berê heye. Ji bilî komkujî û kiryarên dij mirovî gelo ji gel re tu guhartinên erênî pêkaniye yan na?**

Weke ku tê zanîn hikumeta veguhêz bi oparasyoneke leşkerî hat ser desthilatdariyê, ne ku hat hilbijartin û bû desthilatdar. Cudabûna wê ji hikumeta berê nîne. Ew olîgraşiyeke, hêzeke ji çend kesên destnîşankirî pêk tê ku ew hêz dixwazin desthilatdariyê bigrin destê xwe de. Vê yekê jî em di Ehmed El-Şera de dibînin ku ew xwe weke serok dibîne, herwiha birayê xwe yê din wezîrê aboriyê ye, birayên wî yên din jî di wezaretê de cih digre ku dema Ehmed ElŞera nîn be ew civînan bi rêve dibe. bi cewherî hemû dezgehên dewletê ji aliyê xwe ve birêve dibin.

Di aliyê din de jî rêxistina wê heye HTŞ’ê ku rêxistinekî cîhadîst e û ji gelek kesên cîhadîst yên biyanî pêk tê. Di van neh mehan de bi sedan komkujî pêk anîn, li Berava Sûriyê li dijî Elewiya, li Şamê li dijî Xiristiyana, her wiha li Siwêda li dijî Durziyan komkujiyên dijmirovî pêk hatin. Herwiha hewil da beşên din yên civakê li hember hev bikarbîne, Sunî li hember Elewiyan, birêxistinkirina Eşîran li hember Durziyan. Di heman demê de li dijî gelê Kurd heman zihniyeta berê ya rêjîmê dide meşandin. Bi tu awayî hebûna gelê Kurd di Sûriyê de qebûl nake. Herî dawî Kurdan bi Tirkiyê û Îraqê dide gef xwarin. Di pênasekirina vê desthilatdariyê de mirov dikare bêje tu rengên netew, pêkhate, ol, bawerî û civakan qebûl nake. Dixwaze welatekî girtî, tarî yek reng bide avakirin ku tu rengê demokrasî û gelan tê de nîn be.

**-Hikumeta veguhêz dagirkirin û parçekirina xaka Sûriyê ji aliyê hêzên herêmî û bi taybet jî dewleta Tirk qebûl dike, lê demokratîkbûna Sûriyê qebûl nake, sedma vê yekê çi ye?**

Di destpêkê de divê em pirs bikin gelo hikumeta veguhêz rast axa Sûriyê û gelê wê diparêze, gelo siyaseta wê Sûriyê parast yan parçekir? Hikumeta heyî bi komkujiyên ku li dijî gelê Elewî û durzi pêkanîne, herwiha zimanê gefê yê ku li hember Rêveberiya Xweser bikar tîne, Sûriyê ji hev du dixe û ber bi perçebûneke mezin ve dibe. Wan hişt ku niha Durzî behsa serxwebûnê bikin, herwiha elewî xwe birêxistin bikin û doza fedraliyê bikin.

Di heman demê de siyaseta wan bi Tirkiyê re nehatiye guhertin, tevî ku Tirkiyê gelek herêmên Sûriyê dagirkiriye û guhartina demografîk pêk aniye. Rûxmî vê jî ev herêm nabin mijarên hikumeta veguhêz ku gelê wan herêman bi darê zorê hatine koçberkirin û siyaseta dagirkeriya Tirkiyê qebûl kiriye. Ev tê wateya ku hikumeta heyî rewşa parçekirina Sûriyê erê kiriye û hê jî bi siyaseta xwe ya înkarkirina nasnameyan, neqebûlkirina demokrasiyê û neqebûlkirina forma Rêveberiya Xweser Sûriyê parçe dike. Ji ber vê yekê em bi rihetî dikarin bêjin siyaseta vê hikumetê, Sûriyê parçe dike. ji derveyî vê siloganên ku dibêjin em yekîtiyê dixwazin û hwd ev hemû ne rastin. Ev hikumeteke olîgarşiye û desthilatdariyê esas digre. Ji ber wê niha hewil dide suniyan birêxistin bike, sor bike û radîkalîze bike ku bi rêya Suniyan li dijî hemû pêkhateyên Sûriyê komkujiyan pêk bîne.

**-Rûxmî hemû hewildanên Rêveberiya Xweser a danûstandin û peywendiyan ji bo avakirina Sûriyeke ne navendî, lê hikumeta heyî bi berpirsyariyeke cidî nêz nabe û mijara entegrasyonê berûvajî digre dest û dixwaze her tiştê ku pêkhatî ji holê rake. Gelo ger wisa berdewam bike wê pêşeroja Sûriyê ber bi ku ve biçe?**

Hikumeta veguhêz di aliyê pêkanîna rêkeftina 10’ê Adarê de ne cidî ye. Dixwaze hevgirtina di Bakur û Rojhilatê Sûriyê û QSD’ê de, ji hev bixe. Hewil dide nasnameya Kurdan tu carî qebûl neke. Vê yekê jî bi taybet bi destê Tirkiyê dike ku her dixwaze herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikevin bin dagirkeriya Tirkiyê de û bi wê re cîhadîstên xwe derbasî vir bike û giştî destkeftiyên herêmê bixe di bin serweriya xwe de. Yanî xeyal û zihniyeta ku di serê hikumeta heyî de ev e, ne çareserkirin û bi hev re jiyankirine.

Di van mijaran de rast nêz nabin, heger derfet di aliyê leşkerî de di destê wan de çêbibe wê êriş jî bikin. Lê baş dizanin ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne weke herêmên Beravênê û binkeftina wan di vir de misoger e. Ji ber wê jî hewil didin bi rêya sextekariyê dixwazin Kurdan û Xweseriyê qels bikin.

Dasthilatdariyeke ku niha dev ji ax û gelê Sûriyê berdaye. Peymana ku bi Israyîlê re îmzekiriye ku sê parêzgehên Sûriyê dest jê berda, herwiha serê xwe li hember Trikiyê datîne û bi welatên Ereban re bazaran dike. Hikumeteke bi vî awayî helbet wê temenê wê ne dirêj be. Di nav desthilatdariya olîgraşî de, em dibînin ku gelek kesayetên bi nav û deng di nava Suniyan de xwebirêxistin kirine û li dijî wê radibin. Herwiha ji bajarên mezin jî li dijî komên cîhadîst nerazîbûn heye, ev tê wateya ku di nava Suniyan de jî nerazîbûn û xwepêşandan hene. Tişta ku niha tê xwestin QSD’ê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên din re yekîtiya xwe xurt bikin, herwiha li hember vê desthilatdariyê tu tawîzan nedin. Ji ber temenê vê desthilatdariyê di Sûriyê de, kin e.



## HTŞ’ê bi van siyasetan ben li stûyê xwe badide

**Dilyar Cizîrî**

Piştî 9 mehan Serokê hikûmeta veguhêz a Sûriyê Ehmed El Şeri beşdarî civîna giştî ya meclîsa Neteweyên Yekbûyî (NY), bû. Alîgirê El Şeri û ragihandina ser bi hikûmeta veguhêz a Sûriyê vê beşdarbûn wî wekî serkeftina herî mezin binav dikin. Nizanin heger li ser erdê û di hindir de çareserî pêk neyên derve wê tu carî dûrî berjewendiyan gavan ber bi çareseriyê ve navêjin.
Me dît çawa li Perava Sûriyê û Siwêdayê komkujî pêk anîn. Bi hezaran insan hatin kuştin. Jin hatin revandin û heta niha jî li Siwêda û Peravê jinên windayî hene. Daristanên Laziqiyê, Tertûs, Hema û Homisê têne şewitandin. Di mijarên xizmetguzariyê de gavan navêjin.
Di mijara danûsitandinên bi QSD’ê û Rêveberiya Xweser re tevî peymana 10’ê Adarê hatiye imzekirin, nikarin di pêkanînê de biryaran bistînin. Berûvajî hîn di siyasetên xwe yên inkar, ne qebûlkirin û zordariyê de bi israrin. Di daraza destûrê de kopiya rêjîma Baas bi qabekî nû vejîn dikin. Di kongreya xwe ya niştimanî de heman tiştî pêk tînin. Hîn jî naxwazin rastiyan bibînin.
Rişma xwe bi temamî radestî istxbarata Tirkiyê kirine û li gorî berjewendiyên wê tevdigerin. Gihiştiye asta Serokê Hikûmeta HTŞ’ê Ehmed El Şeri bi hêza dewleta Tirk gefan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bixwe. Ev di gotina wî ya li ser saziyên ragihandinê “Dibe Tirkiyê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişan pêk bîne.” Asta girêdana wan bi dewleta Tirk ve xuya dike. Li şûna çareserkirina pirsgirêkên gelê Sûriyê yê bi salan zulim û zordarî kişandiye çareser bikin. Xwe davêje himbêza dewleta Tirk û Erdogan. Êrişên li Dêrhafirê, girtina riya di navbera Heleb û Reqayê, êrişên li Dêrazorê yên bi destê DAIŞ’ê têne kirin. Hewldanên belavkirina kîndariyê û derxistina tevliheviyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû di vê çarçoveya hevkariya wan de pêk tên. Heger rayedarên hikûmeta veguhêz a Sûriyê di vê siyaseta xwe de berdewam kirin û di hindirê Sûriyê de gav neavêtin, dê nikaribe bi civînên Neteweyên Yekbûyî hebûna xwe rewa bikin. Gelê Sûriyê li benda guhertinan in. Ne li benda şer, alozî û nakokiyên din in. Tişta balkêş ew e Hikûmeta veguhêz nikare xwe ji vê xeleka heyî derbixe Ji lewma jî nikare li ser erdê tu pirsgirêkan çaerser bike. Alozî û bermahiyên hikûmeta hilweşiyayî ya rêjîma Baas kûrtir dike. Beşar El Esed xwe spartibû Îran û Rûsiya û çarenûsa wî dawî xuya kir. Ehmed El Şeri jî xwe spartiya dewleta Tirkiyê û li ber bayê wan diçe.
Bê guman heger El Şeri bi vê zihniyeta xwe dewam dike kir, wê çarenûsa wî ya rêjîma Beşar El Esed be. Ev nêzîk be yan dûr be. Ne mumkine gelê Sûriyê qebûl bike careke din xwe di bin siya zulim û zordariyê desthilateke tundrew de bihêle. Bayê guhertinê ya Rojava destpêkir, derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Niha di Siwêda û Perava Sûriyê de liba dibe. Yekîneyên Parastina Jinan a Siwêdayê vê rastiyê nîşan dide. Ehmed El Şeri û Wezîrê wî El Şêbanî li derve çi bikin bila bikin, çavkaniya guhertinê di nava gel de ye.

# Şêwazê şerê cîhanî yê sêyemîn!

**Navenda Nûçeyan**

Teşeya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn di lêkolînên stratejîk û jeopolîtîk de mijarek herdem xwe dûbare dike. Ev şer, ger biqewime, dê ji ber pêşketinên teknolojîk, guhertinên di hevsengiya hêzê de, pirsgirêkên avhewa û aborî ji du şerên cîhanê yên berê cuda be.

Ji dawiya Şerê Sar yê di sala 1991’an de, cîhan ketiye serdemeke hevsengiya ne aram ku pêşbaziya di navbera hêzên mezin (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Rûsya û Çîn) de di gelek waran de zêde dibe; wekî leşkerî, aborî û sîberanî. Gelek lêkolîner bawer dikin ku şerê cîhanî yê sêyemîn, ger derkeve holê, dê dijwar û piralî be, herwiha wê ji modelên şerê kevneşopî(Teqlîdî) pir cudatir be. Wekî em dizanin, 9 welatên cîhanê xwedî çekên nukleerî ne, li cem van welatan zêdetirî 13 hezar serikên şer yên nukleerî hene. Hêzên cîhanî yên xwedî çekên nukleerî di destpêka her pevçûnekê de bikaranîna rasterast a çekên nukleerî ne mimkûn dibînin, lê eger rêgirtin û kanalên danûstendinê yê stratejîk di navbera wan de hilweşin, ihtîmala bikaranîna çekên nukleerî zêde dibe. Lêkolînên dawî nîşan didin ku êrîşên sîbranî dikarin beriya pevçûnên leşkerî yên teqlîdî werin kirin û binesaziyên girîng ên wekî enerjî, av û ragihandinê hedef bigirin. Ev êrîş dikarin welatekî bi tevahî têk bibin, ji ber ku di sedsala bîst û yekê de şerê sîbranî bû xwedî qadeke şer a pir berfireh e.

Di heman demê de hişê jêkirî jî di warê leşkerî de, bi taybetî di pergalên diron, balafirên bêmirov û çekên jixweber dixebitin de, bi lez pêş dikeve. Ev hêza elektironîk dikare bibe sedema derketina şerên elektoronîk ku xetera windakirina jimarên zêde ji mirovan bi xwe re bîne. Tê çaverêkirin ku Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi awayekî rasterast wekî şerê teqlîdî nebe. Berevajî vê, ew ê bi îhtîmaleke mezin şerekî tevlîhev be ku tê de şerê teqlîdî û sîbranî bi hev re bê meşandin. Li gorî şîrovkarên leşkerî Ihtmaleke mezin heye ku destpêkê herêmên wekî Rojhilata Navîn, Ewropaya Rojhilat û Deryaya Başûrê Çînê bibin qadên ceribandinê ji bo van şêwazê şeran. Li aliyekî din li gorî Desteya Navdewletî ya Guherîna Avhewayê (IPCC) guherîna avhewayê dê metirsiya pevçûnên li ser çavkaniyan, bi taybetî av û enerjiyê, zêde bike. Gelek lêkolîneran ewlehiya avhewayê wekî ajokerek sereke ya pevçûnên pêşerojê hesibandine. Lê heta niha tevî ku nîşaneyên mezin yên destpêkirina Şerê cîhanî yê sêyemîn li dû hev derdikevin holê, girêdana navbera hêzên mezin û berjewndiyên wan yên hevbeş li pêşiya ketina cîhanê ber bi şerekî giştî ve dibe astengiyeke mezin.



# ‘Pêwîst e ciwan tev ramanê Rêber Apo bixwînin û xwe bi rêxistin bikin’

Ciwanên bajarê Qamişlo diyar kirin ku derketina derveyî welat ne çareserî ye, berovajî wê ciwan dikevin bin xizmeta hêzên desthilat de û wiha gotin: “Pêwîst e her ciwanek fikir û felsefeya Rêber Apo bixwîne û li hemberî polîtîkayên ku li ser civakê têne meşandin têkoşînê bimeşînin û xwe bi rêxistin bikin”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şandeya Îmraliyê ya Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî), piştî demekê dirêj di 28’ê Tebaxê de li Girtîgeha Tîpa F a Ewlekariya Bilind a Îmraliyê bi Rêber Apo re hevdîtin kir. Hevdîtin sê saetan dewam kir û hat diyarkirin ku li ser gelek mijaran hatiye nîqaş kirin. Hat zanîn ku di hevdîtinê de Rêber Apo têkildarî ciwanên koçî Ewropayê dibin nirxandin û rexnên girîng kir. Di vê çarçoveyê de Endamê Meclisa Ciwanan ya Kantona Cizîrê Hogir Qamişlo û Endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger Elend Hesen ji Rojnameya me re axivîn.

Hogir Qamişlo di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku çareserî ne pişta xwe dana welatê xwe ye: “Wek tê zanîn ku di herî dawî de Rêber Apo nameyek ji bo ciwanên ku diçinin derveyî welat û bi giranî mijara çûyina ciwanan ji dervyî axa xwe rexine kir. Di destpêka Şoreşa Rojava gelek welatî û bi taybet ciwanên kurd derbasî aliyê Ewropayê bûn, dema ku dihat gotin ku çima ciwan ji axa xwe direvin û dibin koleyê dewletên derve? Bersiva malbatên wan ev bû ku ji ber zor û zehmetiyên jiyanê pêwîst e hin zarokên me derkevin Ewropayê ji bona destekê bidin malbatên xwe. Lê di rastiyê de sedema derketin ango reva ji welat tê wateya kêm welat parêzî û ew kes di bin kontrola dewletên hegemondene, dema mirov bi zelalî li vê mijarê bifikre wê encam ew be ku dewletên hegemon bi zanebûn van ciwanan dikşîne aliyê xwe û bi taybetî jî ciwanên Rojavayê Kurdistanê. Ji ber li Rojava şoreşek hat destpêkirin û heya niha jî ev şoreş dewam dike, bêguman dewlet jî ew polîtîkiya xwe ya qirêj dide meşandin tenê ji bo têkbirina şoreşê û destkeftiyên wê, piranî ciwanan birin aliyê xwe. Yanî derketina ciwanan ne bi sedemên şer û pevçûnan ango ji bo zehmetiyên jiyanê, lê belê ev jî siyaseteke dewletê ye ku herêma me vala bimîne û ew hêza mezin a ciwanan nemîne.”



Hogir Qamişlo



Elend Hesen

**‘Fikir û felsefeya Rêber Apo bixwînin’**

Endamê Meclisa Ciwanan ya Kantona Cizîrê Hogir Qamişlo di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Em û tevahî ciwanên Kurdistanê pêwîst e fikir û fesefeya Rêber Apo bixwînin û nasbikin. Ji ber ku Rêber Apo siyaseta dewletên hegemon û dagirker baş dizane, di heman demê de nirxandina vê yekê di pareznameyên xwe de bi awayekî berfireh û zelal kiriye, bêguman li kêleka van nirxandin û pirsgirêkên heyî, çareserî jî daye pêşiya me ku em çawa xwe radestî dijminekî ewqas bêbext û xapînok nekin. Di heman wextî de ku çawa em xwe li hemberî şerê taybet yê ku hêzên desthilat li ser ciwan û jinan dide meşandin biparêzin. Herwiha tişta ku niha ji me tê xwestin rêxistinkirina civakê ye.”

**‘Ciwan li Ewropayê ketine bin bandora sistema kaptalîzmê de’**

Di heman çarçoveyê de Ciwanê bi navê Elend Hesen da zanîn ku dewletên desthiletdar ne tenê ciwanan di bin navê koçberiyê de dihewîne, lê belê kesê zana û rewşenbîr jî bi riya xwe wan dibin û wiha domand: “Dewletên desthilatdar dibêjin “Em li koçberên Sûriyê xwedî derdikevin”. Lê ev yek ne rast e. Li Ewropayê ew kesên ku kar bidin meşandin pir kêmin, ciwanan dikşîne milê xwe û ji bona berjewandiyê xwe. Em behsa ciwanên ku niha li Ewropayê jiyan dikin û welatê xwe berdane dikin, ev ciwan ketine di bin xizmeta hêzên serdest de. Lê ew niha di xewekî giran de ne û hîn jî bi ser hişê xwe ve nehatine ku bizanibin ev polîtîka hêzên serdeste û di bin navê alîkarî û xwedî lê derketinê dide meşandin. Ewropa ciwanan bi destheqekî erzan ji bona xwe bi kartîne û abûriya xwe pê xurt dike. Li ewropayê ciwan karê paqijiyê dikin û bajarên ewropayê paqij dikin, lê dema ku em li vir dibêjin ciwanan werin em bajarê xwe paqij bikin, guhdar nakin û vê yekê ji xwe re mîna şerim û kêmanî dibînin.

**‘Banga Rêber Apo ji bona tevahî ciwanan e, û pêwîste ku em pêkbînin’**

Endamê Ciwanên Şorerşger Elend Hesen di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em ê heya dawî têbikoşin û li ber xwe bidin, yê ku welatperwerbe û girêdayê ax û rûmeta xwe be, ne mumkine dûrî welatê xwe bikeve û xwe radestî dijmin bike. kesê welatparêz dibe pêşeng û şoreşger û xizmeta gelê xwe dike. Ji ber vê yekê bila tu kes xwe di bin navê jiyan zehmete û derketina Ewropayê çareseriye de, nexapîne. Tişta ku niha ji me û tevahî ciwanan tê xwestin ew e, ku em asta xwe ya zanebûnê pêşbixin û ramanê Rêber Apo bixwînin, di heman demê de xwe bi rêxistin bikin.



## 3 Fotograf û şerm

**Farûk Sakik**

Civîna 80’yî ya Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî hefteya derbasbûyî, li New Yorkê pêk hat. Beriya civînê konferansek jî di bin serokatiya Fransayê de, bi sernavê “Dîtina Çareseriyek ji bo Pirsa Filistînê û Pêkanîna Çareseriyek du Dewletî” hat organîzekirin. Di vê konferansê de ya herî balkêş axaftina Erdogan bû. Dema dest bi şova xwe kir, 4-5 fotografên bandor li wijdanê mirovahiyê dike nîşan dan. Bi van fotogarafan dixwest zilma dewleta Îsraîlê teşhîr bike. Me dema temaşe kir, komkujiyên li Kurdistanê, bi destê dewleta Tirkû bi fermana Erdogan pêk hatibûn, hatin ber çavên me.
Fotograf -1
9’ê Cotmeha 2019’an êrişên dagirkirina Serêkaniyê dest pê kirin. Di vê dagirkeriyê de me zarokek bi nave Muhamed nas kir. Bi çekên kîmyevî hatibû şewitandin û di kêliyên dermankirinê de diqêriya. Me dixwest kesek piştî axaftina Erdogan a li salona NY’ê derketa û di dest wî de ew fotogarafê Muhamed nîşan bida. Qêrîna wî zarokî di dîmenê de me bi guhê xwe bihîstibû. Ew kesên li salona Neteweyên Yekbûyî dema ku li vî forografî binêriyana wê dengê Muhamed jî bibihîstana. Wê demê ev fotograf bandoreke mezin li ser Kurdan çêkir. Piştî wî dîmenê Muhamed, Kurdan li ser medya dijîtal fotogarafên zarokên xwe parve nekirin. Şerm dikirin.
Fotograf -2
Di salên 90’î de li Kurdistanê di şer de dema ji gerîla derb dixwar dîsa vedigeriyan kuştina sivîlan. Di 3’ê Cotmeha 1993’yan de li Mûşê li Vartinisê ji malbatek 9 kes bi saxî ji aliyê eskerên dewleta Tirk ve hatin şewitandin. Ji vê malbatê fotografek heye û bûye sembola vê bûyerê. Xweziya kesekî bi vî fotografî bersiv bida Erdogan. Dokumantera vî komkujiyê hat çêkirin. Wê demê kesek zarok û şahidê komkujiyê bû, digot; “me futbol dilîst. Em hatin û me ew cesed dîtin, êdî me futbol nelîst. Şerm dikirin.
Fotograf -3
Piştî 15’ê Tebaxê li herêma Kurdistanê şer û pevçûnan nû dest pê kiribû. Dewleta Tirk bi taybet li herêma Cizîrê bi hovîtiyeke mezin dixwest gel ji gerîla qut bike. Ji destpêkê dixwest tedbîran bigire. Di 14’ê Çileya 1989’an de, li Kurdistanê li Hezexê li gundê Yeşîlyûrt bûyerek qewimî. Bi saetan îşkenceyên giran li gundiyan kirin. Bes nekir, evcar gundî rêz kirin û dixwestin ku bi zorê pîsîtîya mirovan bi herkesî bidin xwarin û wisa kirin. Ev pîsîtî bi zilikek, yek bi yek bi devê herkesî hat dayîn. Piştre zext dan ku kurê Kamîl, Bahattîn Muştak ew jî pîsîtiyê bide bavê xwe û wisa kir. Ji wê komkujiyê tu belgeyek di dest me de tuneye. Lê piştî buyerê rojnamevan Celal Başlangiç çû Yeşîlyûrt fotografek Mîzansen kişand. Xweziya li salona NY’ê di destê kesekî de ev fotograf hebûya. Piştî ku sal derbasbûn gundiyek behsa wê rojê dikir û digot; “Ew roj kesên ku cigare nedikişandin, cigare pêxistin. Kesî li rûyê kesî nedinêrî.” Şerm dikirin.
Lê Erdogan şerm nekir. Ev 3 fotografên zulma li Kurdan kirine hatin berçavê wî lê wijdan nehat bîra wî. Em 2 fotografên beriya desthilata wî deynin aliyek. Fotografê Muhamed ê Serêkaniyê wî dabû kişandin. Îro li Amerîka, li Sûrî li gelek deveran di lêgerinekê de ye ku axa Mihamed dagir bike û gelek fotografên dişibin qêrînên wî ji nû de bide kişandin. Şerm nake
Dibe ew roj li navenda Neteweyên Yekbûyî kes tunebû van 3 fotografên trajediya Kurdan a ji aliyê Erdogan û dewleta Tirk ve pêk hatine nîşan bidin. Lê Kurd û Tevgera Azadiyê ji bo tola van 3 fotografan têkoşîneke mezin dane.

## Sûriyê çawa tê rêvebirin?



**Zekî Bedran**

Sûrîye dê di bin serweriya HTŞ’ê de ber bi ku ve diçe? Divê ev pirs ji hêla hemû derdorên ku bi civaknasî û siyasetê re eleqedar in ve were pirsîn. Rewşenbîrên Sûrîyê û yên ku daxwaza demokrasiyê dikin divê bi taybetî vê yekê bifikirin. Hin rewşenbîr û derdorên ji Sûrîyê xuya dikin ku bêrêxistin û bêhêvî ne. Em bêhêz in û em nikarin bibandor bin. Hêzên ku bandorê li Sûrîyê dikin jî li gor berjewendiyên xwe yên takekesî tevdiger in. Gel jî bêagahî û bêrêxistin e, û ew bawer dikin di wê rewşê de ku ew nikarin tiştek ê bikin. Bi kurtasî, ew ji pêşeroja azadî û demokrasiyê metirsî jiyan dikin û ew pir xwedî bendewariyekê nîn in. HTŞ naxwaze vîna gelên Sûriyê hemû bib e xwedî maf û roleke yekgirtî bilîze. Ew xwedî xwedîyê hişmendiyekê wisa ya civakî nînin. Ew bendewariya hikûmeteke navendî û olî ya hişk diparêz in. Ew naxwazin kesên ku bi wan re piştgriyê nakin, di xebatên siyasî de cih bigir in. Ew bawer dikin ku “em hatin Şamê û dezgehên hikûmetê girtin destê xwe, ji ber vê yekê dewlet û desthilatdarî mafê me ye.” Piraniya komên di nav HTŞ’ê de endam û çeteyên El-Nusra û DAIŞ’ê ne. Ehmed Şera û DAIŞ’ê di vê serdemê de teqez kir ku her çend ew ji her kesî re dibêjin ku ew guherîne, lê di rastiyê de neguherîne û tiştê ku ew dixwazin dikin. Wan bi komkujiyan bersiv dan pirsgirêkên li herêmên Elewiyan. Wan heman kiryar li dijî Durzîyan jî pêkanîn. Gelo ew kesên ku dibêjin em guherîne komkujiyan dikin, malan dişewitînin û serî li talanê didin? Gelo ew jinan direvînin û mirovan bê cudahî, çi kal bin çi zarok, îdam dikin? Wan ti rêz ji zagonên şer ên mirovî û pîvanên exlaqî ne girtine û ti fikarên wan ên wiha jî nînin.

Gelo piştî hatina ser desthilatê HTŞ’ ev kir? Na, pêkanînên wan ên berê dişibin hev. Ji ber vê sedemê, ew ji aliyê NY, DYA, Ewropa û gelek welatên din ve wekî rêxistineke terorîst hatin nîşan dan. Ahmet Şera bi mîlyonan dolar xelat bi bona radestkirina wî dihat dayin. HTŞ piştî ragihand ku xwe guheriye jî DYA ev dûbare kir. Ev pêkanîn nîşaneya kiryarên wan in. Dema ku HTŞ ev komkujî kirin, ew hîn li ser Sûriyê ne di bin serweriya wan de bû. Ew hewl didan ku ji hêzên navneteweyî çiraya kesk bigir in û xwe baş bidin xuya kirin. Ji ber ku wan ev komkujî di vê serdema veguhêz de kirin, dema ku hîn jî qels bûn, ew ê çi kiryarên xeter pêkbînin ger ew li Sûriyê tevahî serdest bibin û hikûmetek navendî ya hişk ava bikin? Ehmed Şera di 10’ê Adarê de peymanek bi fermandarên QSD’ê re îmze kir. Li gorî vê yekê, ew ê Kurdan wekî hêmanek bingehîn a Sûriyê nas bikin û mafên wan li gorî destûrê mîsoger bikin. Agirbest dê li seranserê Sûriyê were bicîhanîn. Çend roj piştî vê îmzekirinê, destûra demkî ya ku ji hêla HTŞ ve hatî amadekirin, behsa Kurdên ku di peymanê de beşdar bûne nekir. Destûra demkî Kurd û mafên wan paşguh kir. Diviya bû li seranserê Sûriyê agirbest hebe, lê ji mehekê şûnde, li dijî Durziyan qirkirin pêk hat. Dema ku hikûmeta demkî hate ragihandin, Kurd, gelên herêmên Rêveberiya Xweser, Durzî û gelên din hatin derxistin. Ji ragihandina hikûmeta veguhêz û heya niha li Sûriyê ti aramî pêşneketiy e. Her çiqas nakokî û pevçûnên desthilatê bi Durzîyan re hebe û pirsgirêk çareser neb in jî, ew hîn jî welatiyên Sûriyê ne. Pêwîstbû ku bi awayekî çêker bi wan re danûstandin hatiban kirin, lihevkirinek çêbiba û pirsgirêk çareser kiriban. Ev desthiladarî berpirsiyariyek li hember gelên Sûriyê tevahî heye. Lê, ew di bin dorpêçê de hatin danîn, ji ber ku Durzîyan wekî ku dixwestin tevnegeriyan. Niha Siwêda di bin zext û dorpêçêde ye. Piraniya Durzîyan ji bo ku ji komkujiyan birevin penaberî Îsraîlê bûn. HTŞ Durzîyan ji ber vê yekê sûcdar dike. Ew gelên Sûriyê li dijî wan sor dike, wan wekî xayîn û hevkarên Îsraîlê nîşan dide. Lê ew kiryarên ku HTŞ’ê pêkanîn û Durzî neçar kirin ku bi komkujiye re rû bi rû bimînin, ji tu kesê napirse. Ew berpirsiyariya xwe nas nake. Ew rastiyan berovajî dike û yên ku ji qirkirinê re rû bi rû mane tawanbar dike. Wan ji bo eşkerekirina kesên ku li dijî Elewiyan komkujî kirine, qaşo desteyekê lêpirsînê ava kir. Bi awayekê zelal kuştinên sivîlan li wir hatin belge kirin. Eşkere bû ku ev deste dê rastiyê eşkere neke. Hikûmeta HTŞ ew vesazî kir in. Her çend wan deste ava kir da ku xwe bê sûc bidin xuya kirin jî, deste neçar ma ku hin kiryarên ku ji aliyê HTŞ’ê ve hatiye kirin bi pejirîn e. Tevî vê yekê, gelo kesek hatiye girtin û darizandin? Na.
Hikûmeta veguhez gotina ku ji Tirkiyê wergirtiye bikar tîne, ku dibêje qaşo Kurd dê dewletek cuda ava bikin û Sûriyê, li gorî dilê xwe, dabeş bikin. Kurdan û QSD bi berdewamî rêyên çareseriyê ji bo goftûgoya bi Şamê re û amadebûna xebata bi hev re ji bo çareseriyê diyar kirine. QSD û Rêveberiya Xweser bi erênî li rolên navbeynkariyê yên dewletên wekî DYA û Fransayê nêz bûn. Lê, ew hikûmeta veguhêz bi xwe bû ku ji hevdîtinan dûr ket û ew jî asteng kir in. Ew ji hevdîtinên Parîsê vekişiyan. Tevî vê yekê, Rêveberiya Xweser helwesta xwe ji bo avakirina Sûriyekê demokrat diyar kir û bi Şamê re hevdîtinan domand. Hikûmeta Şamê niha hewlên xwe ji bo ferzkirina dorpêça li dijî herêmên Rêveberiya Xweser zêde kiriye. Her çend kelûpel û bazirganî bi awayekî zehmet tê meşandin jî di nav herêmên HTŞ de derbas dibin jî, wan seyare, kelûpel û bazirganiya ji herêmên Xweser ber bi herêmên hikumeta veguhêz ve qedexe kiriye. Rêya Reqa-Helebê ji bo trafîkê hatiye girtin. Ew dixebitin ku herêma Rêveberiya Xweser ji hêla aborî ve qels bikin û mafê tevgera azad a gel asteng bikin. Yên li rojhilatê Firatê ne û li herêmên Rêveberiya Xweser dijîn hemû welatiyên Sûriyê ne. Gelo ew kesên ku sînor di nav Sûriyê de danîne û herêm ji hev veqetandine, cudaxwaz in, an jî ew kesên ku dixwazin ev kiryar bi dawî bib in? Di rastiyê de, ew hikûmeta demkî bi xwe ye ku Sûriyê dabeş dike, hin herêman dorpêç dike û zextê li ser gelên Sûriyê ferz dike.